Bêguman, hêmana yekemîn ji bo serkeftina miletan hebûna bîrdoz û bingehên zanyarî ye. Ev jî bêyî hebûna zana û rewşenbîrên welatperwer peyda nabe. Hûrnerînek li rewşa çand û rewşenbîriya Kurdî baş dide xuyakirin ku Roso û Voltêrê miletê Kurd nebûn da ku bingeheke zanistî ji serkeftinê re deynin. Di gel vê jî rastiyeke dî heye, lê sed mixabin ku ew tehil e, ji ber ku piraniya rewşenbîrên Kurd berjewendiyên xwe yên kesayetî didane pêş û yên giştiyane paşguh dikirin. Dezgehên ragihandinê, saziyên çandewarî û komelên nivîskar û rewşenbîran ketine bin bandora êş û nexweşiyên partî û siyasetmedaran. Nexweşiya dabeşkirinê û tunebûna hevkarî û hevrêziyê di navbera wan de bûne sedemên pirbûna nakokiyên kesane, û herwiha jî dûrketina wan ji berjewendiyên netewî yên giştiyane.

Hêmana duyemîn ji bo serkeftina netewî ya miletan hebûna tevgereke siyasî ye hevgirtî, û yekrêziya xebata beşên wê ye. Bav û bapîrên Kurdan wiha gotine: "Ketî, bi xebatê radibin." Lê ka em ji xwe bipirsin: Gelo tevgera siyasî ya Kurdî li gorî vê pendê ye, yan na? Bêguman, nerînek li nexşeya têkoşîna siyasî, nemaze ya partiyan, dide xuyakirin ku berjewendiyên partiyane û yên kesane pêştir in ji yên kurdayetî û Kurdewariyê. Her kes dizane ku îro roj bêhtir ji berê, yekrêzî û yekhelwestiya tevgera Kurdî tê xwestin, da ku karibin doza xwe ya netewî li ser maseya guftûgo û danûstandên navnetewî li ser Sûriya siberojê deynin. Lê, li şûna wê ezezî (ezîtî) bûye yek ji nîşanên sereke ji vê tevgera xweperest re. Lewma, Kurd li cem hemwelatiyên xwe ne mirov in, ne jî li cem welatên derdora xwe û ne yên dûr jî, payedar in.

Bêguman, ne tevgera Kurdî, ne rewşenbîr, zana û hişmend, ne jî ew bi hev re karin mafên netewî yên miletê Kurd bicih bikin bêyî piştgiriya milet bi awakî bêlayane ji tevaya tevgera Kurdî ya welatparêz re. Ji ber vê yekê jî, ev piştgiriya gelêrî ya ne layengîr hêmaneke gelek girîng e. Ew rê li ber serastkirina riya xebata netewî vedike.

Di dawiyê de, pêwîst e em tev di wê baweriyê de bin ku tucarî dijmin wê bi hêsanî mafên me yên netewî cihbicih neke, eger em tev xwedî li van mafan dernekevin. Xwedîlêderketina me ew e ku em zanibin ku xebata rast û durust bi yekrêzî û hevgirtina hemû beşên netewa Kurd bicih dibe. Wê hîngê em ê zanibin Penda Kurdî ya dibêje: " Dara xebatkaran tim bi ber e" rast e.

Ji Pazarcix Heta Bi Şehbayê..Êşa Nasnameyê

"Vê carê jî dewleta Tirkiyeyê dixwaze di navbera Rojava û Bakurê Sûriyayê de Ereban bicih bike ku Bakur bi Rojava bibandor nebe, bi taybet jî piştî ku Berxwedana Kobanê biser ket û bandoreke xwe ya mezin li wir çêkir".

Şêrwan Yûsiv

Gelo hûn Pazarxicê nas dikin? Ew der jî Kurdistan e..

Pazarcix deşteke gelek fireh e li Mereşa Bakurê Kurdistanê ye. Erdnîgariya Pazarcixê ji çandiniyê re gelekî guncaw e. Her wiha di aliyê civakî de jî ev herêm ji Kurd û Elewiyan pêk tê, ku ev herdu pêkhate jî li Tirkiyeyê xwedî pirsgirêkên mezin in. Vê dawiya dewleta Tirk xwest ku penaberên Sûriyayê li wir bicih bike; bi taybet jî piştî ku di 17 û 18`ê meha borî de li gel Yekîtiya Ewropayê di mijara penaberan de gihîşte rêkeftinekê. Ji lewre dewleta Tirk xwest ku di vê rêkeftinê de gelek çûkan bi kevirekî bikuje. Lê bi taybet xwest ku vê bazara li ser êşa penaberan bike amûreke şer û dagirkirina li dijî Kurdistanê.

Hikumeta Tirkiyayê hewil dide bi destê saziyên qaşo mirovahî li ser erdekî ji 360 donimî ya di navbera 7 gundên Elewiyan de li deşta Pazarcixa Mereşê cih digire, kampeke penaberan çêbike. Kampa penaberan di navbera Gurgum û pazarcixê de ye.. Gundê ku kamp lê tên avakirin nifûsa wan bi xwe 6 hezar e lê kamp ji bo 27 hezar kesên penaber tê avakirin!

Û hêjayî gotinê ye ku ev penaberên li wir bicih bibin piranî Erebên Sunî ne, ango hikumeta Tirk dixwaze hem li dij Elewiyan bikar bîne û hem jî li dij Kurdan, ku ev siyaset dikeve xaneya (qirkirin û xerakirina rewşa demografîk a li Sûr, Cizîr û Silopiyayê) ku niha li Bakurê Kurdistanê tê meşandine.

Di Plana Şark Islahatê ya 1925'an de jî ku li beramber serîrakirina Kurdan a Şoreşa Şêx Seîd jî derbas dibe ku li Rojavayê Firatê kesên ku bi eslê xwe Kurd divê di pişaftinê re derbas bibin û nehêlin ku bi Kurdî biaxivin. Dîsa jî piştî salên dirêj ku tevgera Ocelanî nû di salên hefteyî de derdiket, di sala 1978 Komkujiya Gurgumê li dij Kurdên Mereşê pêk anîn ku Kurd serê xwe ranekin.

Vê carê jî dewleta Tirkiyeyê dixwaze di navbera Rojava û Bakurê Sûriyayê de Ereban bicih bike ku Bakur bi Rojava bibandor nebe, bi taybet jî piştî ku Berxwedana Kobanê biser ket û bandoreke xwe ya mezin li wir çêkir.

Ji ber wê yekê Tirkiye bi vê yekê bes nake û bi hişmendiya xwe ya Fobya Kurd li dijî Rojavayê Kurdistanê jî polîtîkayeke qirêj a koçberkirinê dide meşandin.

Û eger em herêma Şehba bînin beramberî Deşta Pararcixê ya Mereşa Bakurê Kurdistanê jî, em ê bibînin ku heman rêbaz û siyaset ji aliyê Tirkiyayê ve li dij gelê Kurd tê meşandin.

Şehba deştekekevnare û bi ser Helebê ve tê nasîn. Ji Rojavayê çemê Firatê heya çembera Çiyayê Lêlûnê ya Efrînê ye.

Her wiha gelek pêkhate ji Kurd, Ereb, Çerkez, Turkmen, Ermen û Çeçen ji demeke kevin ve û heta niha bi awakî hevbeş pev re dijîn. Vê herêmê gelek çand hembêz kirine

Ser-erd û bin-erda vê herêmê gelekî dewlemend e. Herêma Şehba dergehê derbasbûna Rojhilata Navîn û Sûriyayê ye, her wiha riyeke sereke ya ber bi Deryaya Spî ve ye jî.

Piştî ku li aliyê Rojhilatê Sûryeyê hemû deverên li ser sînor ketin bin kontrola hêzên YPG`ê de û Kurd bûn aktorekî sereke li herêmê bigiştî, ji lewre Tirkiye niha dixwaze siyaseteke mîna ya Pazarcixê li wir bide meşandin.

Dewleta Tirk a ku ditirse QSD`ê li wê herêmê bi pêş bikeve, di bin navê Artêşa Azad û opozisyona Sûriyayê de siyaseta xwe li wir dide meşandin. Bi taybet jî vê dawiyê ku DAIŞ bajaroka Ra'î ya stratejîk û gelek gundên din radestî wan komên bi ser Tirkiyeyê ve kirin, di wextekê de tê ku rizgarkirina Minbic û herêma di navbera Kobanê û Efrînê de derketiye pêş. Ew komên girêdayî Tirkiyayê guhertineke demografîk li dij Kurdên li wê herêmê didin meşandin ku Ereb û Tirkmenan li wir bicih bikin.

Herêma Şehba ku piraniya gundên wê Kurd in, ev 4 sal in êşa nasnameyê dikişînin, ji DAIŞ`ê de bigire heta bi Sultan Mûrad û Ehrar Şam û gelek komên din komkujiyên Til Hasil, Til Eran û herî dawiyê jî li Kefer Sixîrê pêk anîn.

Di encamê de em dibînin ku çawa li Bakurê Kurdistanê siyaseta guhertina demografîk li dij gelê Kurd li Pazarcixê weke dirêjahiya Îslahata Şerqê û Komkujiya Dêrsim û Gurgumê tê meşandin, di heman wextê de li Herêma Şehbayê jî heman siyaset û qirkirin weke dirêjahiya siyaseta Baes a Kembera Erebî û Komkujiya 12`ê Adarê tê meşandin.

Îro Kurd rû bi rûyê komkujî û xeteriya nasnameyê û qirkirineke çandî ne, di wextekê de ku pêla şovenîzma erebî hem ji aliyê Rêjîma Baes û hem jî ji aliyê qaşo opozisyona wê ve bilind dibe, û dîsa jî li Bakurê Kurdistanê li Sûrê dîroka welatê me tê hedefgirtin û siyaseteke koçberkirinê bi giştî tê meşandin û bi vê yek têr nakin, dixwazin di navbera Rojava û Bakurê Kuristanê de kembereke Erebî-Tirkî çêbikin û Kurdan li serxet û binxetê tune bikin.

Ji lewre divê em vê yekê baş têbigihên ku mayîna li ser xaka Kurdistanê bi tenê, weke Kurdekî ku nasnameya xwe ya neteweyî biparêze berxwedaniyeke mezin e û divê em vê berxwedaniya xwe ya neteweyî bikin saziyeke mezin a tevahiya gelê Kurd ku em bikaribin hebûna xwe biparêzin.

Îro ji Şehbaya Kurdistanê heta bi Pazarcixa Kurdistanê Kurd hene û li ber xwe didin.

Tirkiya Ber Bi Hilweşînê Ve Diçe?

Luqman Silêman

Di destpêka şoreşa Buhara Erebî de Erdogan xwe amade dikir ji bo taca Sultaniyê deyne ser serê xwe! ji lewma bi hemî alavan piştgiriya şoreşa Buhara Erebî kir ji Tûnisê, Misrê û nexasim dema ku Şoreş giha Sûriya wî yeqîn kir ku di demeke nêz de, wê ew taca beriya sed salî li erdê ketî bi destê xwe deyne ser serê xwe, lê bi hin şêwe û alavin nû de, ne wek kalikin wî "Sultanên Osmaniyan"!!?

Xewnên Erdogan yek jê ku destê xwe deyne ser Betrola û xaza Ereban da ku ji bin bandora Rosan derkeve û bi serbestî destê xwe dirêjî welatê Qafqasiya bike û ji ber mayê Mangoliya li wir li dijî Rosan bi kar bîne û Taca Sulataniyê li wir jî bilind bibe.

Ji ber van xewnan û pilanan Erdogan bi hemî hêza xwe destê xwe dirêjî nav şoreşa Buhara Erebî kir, û bi taybetî li Sûriya û deriyê Tirkiya ta bi dawî li ber Mercenariya vekir pere û çek bi ser wan de rijandin ji her derî ew anîn û derbasî Sûrî kirin ji wan re got: Em ê di demek nêz de li Şama Şerîf nimêj bikin!!? Lê xewnê wî ne rast derketin bi têkçûna wî li Misrê û li Tûnisê û li Lîbiya û li Êraqê. Têkiliyê wî û Kurdan tevlî hev bûn, û rewşa di hundirê Tirkiyê de ber bi nexweşiyê ve çû, ewî nema dizanî çi bike, dest bi komkujiyê kir bajarê Kurdan bi ser sivîlan de herfandin bi hezara Kurd ji bajarên xwe koçber bûn. Li Sûrî Kurd bûne xwedî hêz û şervan û erd vegirtin ev ê hişt ku Erdogan bihtir dîn bibe û ji hiş bikeve, ew petrola ji Sûrî di rêya Da'iş re diçû jê re nema! derîk li pey deriyê din li pêşiya wî têne girtin, lewma xwest bêje ez hîn li ser xwe me û tiştek bê min li Sûriyê nabe nexasim piştî ku Rûs bi giranî derbasî Sûriyê bûn xwest li pêşiya Rûsan bisekine lê di wir de jî têk çû.

Dema ku Israîl û Rûsan ji rexekî ve bi hev re hemahingî kirin û ji rexê din ve Rûsan û Emirîkiyan bi hev re kirin his kir ku ew derdikeve ji derveyî lîstikê di vir de wek ku ji xwe re bêje min berê xwe fere kir!! lewma xwest hêza xwe bide ser hev û giraniya xwe bide Sûriya vê carê kaxeza koçbera li dijî Ewropa bikara nî, û rê ji koçberan re vekir kirîzek çêkir Ewropa mecbûr ma ku pê re rûnin û perê ku ew bixwaze bidin da ku deriyê xwe bigre! lê ev jî ne çareye ji bo Erdogan ne ji kirîza wî ya navxweyî û ji ya bi derdora wî re? Erdogan cihûyên li welatê xwe ji xwe re bi karanîn da ku têkiliyên xwe cardî bi Israîl re vegerîne, lê vê carê wê ne li gor ku ew dixwaze? Ji rexê dî ve Erdogan xwest bi lêbûrînekê Rûsan rezî bike lê ta niha ew jî neçûye serî, dîsan xwest wan gotinên xwe yê li ser Israîl di gotin balîse û mercên wa bipejirîne û sînorekî ji tevgera Elhemasre di rojên tê de deyne. Dema ku bi Israîl re kete têkiliya xwest wê zincîra li dor qirika wî hatî pêçan bişkîne û ji rexê dî ve xwest adiziya li Qefqaziya ji Rûsan re çê bike. Niha Erdogan dixwaze têkiliyên xwe bi Misrê re vegerêne, lê hîn derî li pêşiya wî venebûye dibe ku piştî ew Israîl hin gavê dî bi hev re bavêjin deriyê Misrê jî li ber vebe lê gor ku tê gotin Ewropî û bi teybet Emerîka û Birêtaniya dixwazin Erdogan ji holê rakin û niha têkilî bi Fethele Gulan re yê ku berê piştgêriya Erdogan li Emerîka dikir û dibe hin ji hevalê wî di rêz de bin? Ya dî ku Erdogan îro dibêje em ê Regeznamê ji endamê partiya gela bistînin. Diyar e ku Erdogan weka mişkê şehirxwarî lê hatiye lê gelo ew dikare xwe ji vê kirîze derxe û ji wan xewnê xwe şiyar bibe û Taca Sulataniyê ji bîr bike ez ne bawer im? Wê çarenûsa Erdogan û partiya wî reş be, û helbet ew ê buhayê hemû kiryarên xwe yên qirêj deyne..

Gotarên Weşandî Nerînên Xwediyê Xwe Ne

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Bengewaziyek Ji Bo Cinêveke Kurdî

heye ku mirovê Kurd bibîne ku li Rojavayê Kurdistanê û li dora maseyekê hêzên siyasî ên Kurd li hev bicivin û Cinêveke Kurdî-Kurdî lidar bixin û tê de hemû kêşe û nakokiyên xwe çareser bikin.
heye ku ev komcivîn bê lidarxistin bêyî destêwerdaneke ji hêla hêzên Kurdistanî û bi tayebet partiya Demuqrat a Kurdistan- Îraq, û partiya Karkerên Kurdistan PKK?
heye ku ev civîn bê lidarxistin û tê de biryara Kurdên Sûriyê bibe yek û deverên rêzgarkirî bibe cîgeheke ji hemû hêzê rikberiyê re, û tê de siberoja Sûriyê dûrî Ecindeyên dewletên herêmî bê gengeşekirin?
Bêgûman hêzên navdewletî û bi taybet Emerîka û Rûsya rijd bûne li ser dîtina çareseriyekê bo kirîza Sûrî û ev yek di civînên ku têne lidarxistin li Cinêvê di navbera rikberiya Sûrî ku Îtîlaf serkêşiya wê dike, û rêjîmê de bi serperiştiya şanderê navdewçetî Stîvan Dîmistora diyar dibin.
di van hevdîtinan de her aliyekî nerînên xwe derbarî çareseriyê destnîşan kirine, û radestî Dîmistora kirin, di herdû pelikên ku hatine dayîn bo şanderê navdewletî tu amaje bi pirsgirêka miletê Kurd nehatiye kirin, tevî ku du nûnerên Encumena Niştimanî a Kurd li Sûriyê di nav rêzê Îtîlafê de beşdar in di van danûstendinan de!!!?
bê yî ku mirov behsa helwest û nerînên nijadperest ên ku ji serkirdeyên rikberiyê derbarî miletê Kurd ji hêlekê û hustûxwariya herdû (Nûnerên Kurd) û helwesta Rêjîmê em diyar bikin, derfeteke dîrokî ji destê Kurd an diçe, ku bi sedê salan ev derfet nema dûbare dibe.
- Di van rojên dawî de gelek bengewazî ji hêla hin aliyên Siyasî û ciwanên Kurd derbarî yekrêzkirina helwesta Kurdên Rojava û avakirina şandeyeke Kurdî Serbixwe û stendina biryara vekişana beşê ku beşdare di danûstendinên Cinêvê de di rojevê de ye.
xwendineke hûrbîn ji van bengewaziyan re tekez dike ku êdî pirsa Kurd di metirsiyê de ye, û erke ku bi leztirîn dem çareyek bê dîtin û aliyên siyasî li hev bicivin û biryareke netewî di xizmeta çareserkirin û misogerkirina pirsa Kurd li Sûriyê bistînin ta ku Kurd bêpar nemînin ji çareseriya ku wê bê dîtin ji kirîza Sûriyê re.
pêwîst e ku nûnerên encûmena niştimanî a Kurdî li Sûriyê birêz Fûad Elîko û Hekîm Bişar xwe ji desteya rikberiyê a danûstendinên Cinêvê bikşînin û hemû aliyên siysî ên Kurd li Qamişlo bicivin û nameyekê Arasteyî hemû hêzê navdewletî û herêmî bikin û bibêjin em li ser qada xwe ne û ê ku bixwaze danûstendinê bi me re bike em vane.
tenê wê hêvî bimîne an wê rojekê tenê partiyên Siyasî ên Kurd ku dev berjewendiyên xwe ên partîtî û kesayetî berdin.
êdî bûye ji ferzê ku Cinêveke Kurdî –Kurdî bê lidarxistin berî ku em têkçûnên bav û bapîrên Kurdan dûbare bikin.

Ebduselam Xoce

Carekê tenê bila ew yek bibe ku çawa dijminên gelê Kurd li hev dikin dema ku Kurd nêzî azadiyê dibin, em jî bibin yek di xizmeta vî miltê dilşewatê azadiyê.
bila carekê tenê ên sûdê ji şaştî û têkçûnên bav û kalên xwe bikin, û daxwaza me tenê ew be, berjewendiya gelê Kurd di ser her tiştî re ye.
wê ne zehmet be ger viyana kirinê hebî… Tenê bengewazî ye..!

Şêx Meqsûd Dinale… Kerrino Bibihîsin Kûrino Bibînin!

Dawud Çîçek

Ji roja 27 Şubatê ve ku Neteweyên Yekbuyî bi biryara Encûmena Ewlehiya Navdewletî biryara agirbesta li Sûriyê pesend kir şer bi awayekî giştî di navbera girupên ser bi Itîlafa Opozisyona Sûriyê û rêjîma Sûriyê de rawestiya û ji wê rojê de êrişêm ser taxa Şêx Meqsûdê destpê kirin.
Di demekê de ku hêzên kurdî êrişên xwe li dijî rêxistina DAIŞ zêdetir kiriye û roj bi roj gavên bi pêş ve davêje û bi piştevaniya hevpeymaniya navdewletî araziyên ferehetir ji destê terorîstan derdixe û her weha jî rêjîma Sûriyê bi piştevaniya hevpeymanên xwe gelek cihên stratejî ji kontrola terorîstan derxistin lê belê binêrin di vê qonaxê de çekdarên Opozisyona xwe bi çi ve mijûl kirine ji bilî kuştina xelkê sivîl, jin, zarok, kal û pîrên kurdan li Şêx Meqsûda Helebê.
Çekdarên Itîlafa Opozisyona Sûriyê ji roja agirbestê ve heya îro hîç şerekî cidî li dijî Cebhet Nusra û DAIŞ nekirine li dijî rêjîmê jî nekirine û êrişên ku niha li dijî kurdan li Efrînê û Şêx Meqsûdê li dijî sivîlan encam didin ji komkujiyêm bermîlên bombekirî yên Beşar Esed xirabtir û qirêjtir in.
Xelkê me li Şêx Meqsûdê dinalin û hawar dikin û diqîrin partiyên me yên Kurdî yên ku niha li Cinêvê li kêleka berpirsên van grupên çekdar rûniştina ji wan re nabêjin ew topên cehenêm ku hûn davêjin Şêx Meqsûdê gelê min dikujin rawestînin lê belê bi beyannameyek şermînok dibêjin bila şervanên YPG xelkê sivîl ji xwe re neke mertal.. hûn kê dixapînin!!
Ji dêla hûn wan rawestînin hûn wane gur dikin hûnê çi qezenc bikin we tiştekî ku em şanaziye bi we bikin nehîşt we got 'Fîdralî' ji we re gotin "Kurd qereçî ne" berya Beşar Esed gotin em Fîdraliyê qebûl nakin…. Hûn hêviya çi ji wan dikin ey nûnerên ENKS`ê… werin bi rûmet li rêza gelê xwe bisekinin, parastin û bergîriya xelkê xwe bikin dîfa`ê li zarok û jin û ew kal û pîrên ji ber bermîlêm hevalên we yên li Itîlafê bikin carekê bila bêvla we bişewite û em bêjin wele nûnerên me yên Kurd li Itîlafa Opozisyonê nûnertiya me dikin … eger hûn wê jî nakin hûn li wir çi dikin ew dolarên ku hûn dixwin xwîna jin û zarokên me yên li Şêx Meqsûdê şehîd dibinê ye… ji kerema xwe ji wê rewşê derkevin Welah Kurdbûn weha nîne…
Bi baweriya min siyaseta Kurdî û Kurdistanî di qonaxên xwe yên herî aloz û qeyran de derbas dibe û metirsiyên gelekî mezin jî hene bi rastî ez pêşerojeke zelal nabînim ji ber ku parçebûneke û dubendiyeke mezin heye hem li ser asta Rojavayê Kurdistanê û hem jî li ser asta Kurdistanî li Başûr û Bakûrê Kurdistanê… di qonaxeke weha de pêdivî bi wê yekê heye ku Kurd li kêleka hev raweste bi qenc ya neqenc dive em li kêleka hev bin, tirsa min ewe ku carek din dîrok dubare bibe û dîsa Kurd ev derfeta han winda bikin û ji xwe jî em vê yekê li Sûriyê jî dibînin ku çawa hêzên Opozisyon (baasiyên berê) û rêjîma baasê li dijî mafên Kurdan disekinin û me bi cudakar binav dikin.
Ey gelî partiyên Kurd û Kurdistanî ez federalîzmê û serxwebûnê naxwazim ez yekîtiya we dixwazim û hew .. yek bin û li kêleka hev bin û gelê xwe ji tofan û bahozên li navçeyê rabûye biparêzin di vê qonaxê de bese binêrin birayên me yên Bakûr ji bo xatira birayên xwe yên li Rojava îro hemû bajarên Bakûr bûne Şêx Meqsûd û bûne Kobanî çima?
Ji ber ji xwe re qebûl nekirin ku ji aliyekî ve aştî li gel Tirkiyê bikin û Tirkiyê bi hemû hêza xwe bi destê têrorîstan êrişî Serêkaniyê û Kobanê û Efrînê dikin … ev yek ji xwe re qebûl nekirin û hemû berjeweniyên xwe jî kirin qurbana berjewendiyên netewî … îşte îro eve ji hemû kurdan tê xwestin.
Dawiya dawî bang li Encûmena Niştimanî ya Kurd li Sûriyê û Hevpeymaniya Niştimanî ya Kurdî û Partiya Pêşvero ya Demoqrata Kurd dikim dengê xwe bilind bikin û ji berpirsên Opozisyona Sûrî re bêjin rawestin bese hûn gelê me dikujin. Her weha jî ez bang li PYD û TEV-DEM`ê û YPG û QSD dikim ku hûn her roj nûnerên Emerîkî û Rûsî dibînin carekê daxwaz li wan bikin ku moşekeke firokeyên xwe li wan qatîl û namûsizên oposizyonê bibarînin û wan rawestînin.

Li Amûdê Tiştên Ku Min Nedixwest Ez Wan Bibînim

"Rewşa siyasî û civakî ya Amûdê"

Xelek-5

Roja yekem ez gihîştim Amûdê û piştî serdana mezel, min xwest ez bi tenê lê bigerim û bibînim bê çi guhertin lê çêbûne. Yekem tiştê bala min kişand ew bû, ku di van pazdeh salan de pir ava bûye û ji cem mala me li ser riya Qamişlo û heta navenda bajêr valayî nemaye. Xemilandina kolanan bi rengên kurdî û bi wêneyên şehîdan hestiyariyeke mezin bi min re çêkiribû û nizanim çima ji hemû şehîdan bêhtir hevalê min ê zarotiyê û ciwaniyê Melek Şêx Bekir dihat bîra min. Min dixwest wan kêlîkan ew jî bi min re ba. Ne tenê guhertin, lê belê tevlihevî jî gelek di kolanên bajêr de hebû. Cihên dezgeh û saziyên girêdayî rejîmê, ji cihên îstîxbaratan bigre, hetanî bi cihê rêveberê navçê – mudîrê nahiyê – yê ku herdem efserekî artêşa rêjîmê bû, hetanî bi cîgehê partiya Baas hemû bibûn cihên dezgehên girêdayî rêveberiya xweser ku li "Navenda Çanda Erebî" bi temamî bi cih bibû. Amûdê wekî paytext û navenda birêveberiyê jî li wir hatibû bicihkirin. Li kolanan ez li çend kesên ku hevtemenên min in rast hatim. Li gor pêla koçberiyê ya ku hemû Rojava dabû ber xwe, dîsa jî gelek dost, heval û hevtemenên min li wê derê mabûn û bi dîtina wan kêfxweş bûm. Ev aliyekî meselê bû, lê li aliyê din jî ez dixwazim behsa hin aliyên neyênî bikim, behsa wan tiştan bikim ewên ku min nedixwest wan bibînim û min ew dîtin. Ji wan vane çend têbînî û rexneyên min:

• Ala kurdî

Dilê min hebû ku ez ala kurdî ya ku niha bi şaşîtî wekî "Ala PDK'ê" tê binavkirin li kêleka alên kurdî yên din bilind bibînim. Wisa jî birêveberiya Rojava ew al wekî ala xwe ya neteweyî bibîne, ji ber ku ev rastiyeke dîroka me ye û rê li ber van nakokiyên ku di navbera partî û aliyan de derdikevin bihata girtin. Ji bo ev têbîniya min baş bê fêmkirin, yê ku bixwaze dikare vegere gotara min a ku bi taybetî min li ser vê mijarê nivîsandiye. (Linka wê ev e: http://diyarname.com/article.php?Idx=931)

• Tunebûna ciwanan li kolanan

Tiştekî gelekî berbiçav bû, ku li her deverê yan jin yan jî mêrên navsalî û di ser çilî re dihatin dîtin. Ne tenê li dezgeh û kargehan, wisa li sikak û kolanan jî. Li her devera ku me pirsa rewşa wan dikir û bi taybetî ji hêla keç û jinan ve dihat gotin, ku êdî xort di nav civata me de nemane. Beşekî mezin ji wan koçber bûye û ber bi Ewropayê ve çûye. Beşek jî di nav refên YPG'ê de cih girtine û yên mayî jî bi zorê ji bo leşkeriya neçarî –tecnîd icbarî- tên şandin. Ez li mala hin dostan li xortinan rast hatim ku nedixwestin derkevin Ewropayê û terka welatê xwe bikin, lê di heman demê de nedixwestin herin leşkeriya neçarî jî. Bi vî awayî neçar diman ku li malê bimînin, da ku li ser haciz an nuqteyên kontrolê yên asayîşan neyên girtin û ji bo leşkeriyê neyên şandin. Ji ber vê, diyar bû ku qanûna leşkeriya neçarî hem bûbû sedema pêkanîna vê rewşê û hem jî bûbû sedema ku hin malbat zarokên xwe li şûna leşkeriyê bişînin Ewropayê. Ev ne cara yekê ye ku dibêjim, êdî ev qanûn divê bi vî rengê xwe di bin çavan re bê derbaskirin û bê sererastkirin.

• Li Amûdê hîn jî birînên roja reş nehatine dermankirin

Mebesta min bi roja reş roja 27.06.2013 ye. Di vê rojê de û di encama bûyerên ku li Amûdê qewimîn de, ji xelkên Amûdê şeş kes (Arasê Bengo, Eliyê Rindê, Seed Seyda, Berzanî Qerno, Nadir Xelo, Şêxmûs Hesen) bi guleyên asayîşan an yên bi ser YPG'ê ve şehîd ketin û ji aliyê din Sebrî Gulo şehîd ketibû. Vê bûyerê birînên mezin di gewdeyê bajarê Amûdê de vekiribû. Wisa jî ji ber ku xelkên Amûdê hemû hev nas dike vê bûyerê siya xwe ya giran avêtibû ser têkiliyên civakî û siyasî di navbera hemû xelkên bajêr de. Vaye zêdeyî du salan di ser bûyerê re derbas bûye, lê hîna jî ev alozî nehatiye çareserkirin. Di êvareke xemgîn de ji êvarên ku min li Amûdê qedandin, ez çûm serxweşiya "xwarziyê" xwe yê dilzîz û mamosteyê min ê "dinyayê" yê demekê Ebdulbaqî Seyda, bavê şehîdê Seed.

Helim Yûsiv

Bavê wî Seydayê Saduddîn jî ku îmamê mizgefta mezin ya Amûdê bû li wir amade bû. Rûyê Seyda hîn geş bû û di nav cihê xwe de bi rûyekî geş em pêşwazî kirin. Behsa hewildanên çareseriyê kir, ku heta niha bê encam mane. Ji bo Amûda "biçûçik" ew bûyer birîneke "mezin" bû û her û her li benda dermankirinê ye. Min nedixwest ez vê birînê, piştî derbasbûna zêdeyî du salan, hîna vekirî bibînim. Min dixwest ku rêveberiya xweser, nexasim ku navenda wê Amûdê ye, bi çi awayî be riyeke çareseriyê ji vê aloziya civakî û siyasî re bibîne û rê li ber jiholêrakirina kîn û dijminahiya di navbera xelkên yekbajarî de, veke. Ez vê yekê wekî erkeke bilez ya birêveberên xweseriyê dibînim û her ku vê meselê di ser guhên xwe re bavêjin û çareseriyê li paş bixînin, ewqasî birîn jî kûrtir û firehtir dibe û pêre jî rewşa bajêr aloztir dibe.
Ev jî yek ji ezmûnên bajarekî ne, lê gelek ezmûnên giran hîna li pêşiya birêveberiya rojavayê Kurdistanê hene. Careke din emê behsa hinekan ji wan ezmûnan bikin.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Parçebûna Malbatê.. Sedem û Çareserî

“Rast e, dem dema vekirin û pêşketinê ye û pêwîst e têkilî di navbera civakan de û mifa ji çandên wan bê kirin û çanda xwe jî ji bo wan welatan bidin naskirin, Lê yekbûna malbatê yek ji stûnên civaka Kurdî ye, û pêwîst e zarokên wê biparêzin ji bo paşerojeke geş”

Parçebûna malbatê wek pênase ji nemana hevgirtin û têkeliya di navbera yek malbatê de, û windabûna rola endamên wê di avakirin û bihêzkirina wê de, û hinek bi “bêhêzbûna malbatê” nav dikin. Li gor nivîskar û vekoleran, sedemên parçebûna malbatê ew in ku endamek ji wê dûrî jiyana maliyên xwe dikeve, yan jî cudabûn di navbera dayik û bav de peyda dibe, û dibe sedema windabûna zarokan, dîsa beşek din ku bi malbata vala navkirin û merema wan jê ew e di yek malê de çend mal hatine avakirin, gava her yek ji wan bi karê xwe ve mijûl e, bê ku pirsa endamên din bike û hezkirin di navbera wan de gelek kêm dibe û wiha diyar dibe ku xêzaneka bê ermenc e.

Beşek din ji nivîskaran wek sivik kirin vê pirsgirêkê û bi nerînek dûr nav dikin bi “dawî înana malbatê” û gelek nerîn jî bo vê gotinê hene.

Piştî şoreşên li gelek welatên Rojhelata Navîn peyda bûn, di van salên dawiyê de hijmarên mezin ji malbatan qurbanî dan, çi ji kuştina endamekî yan jî mirina yek ji serkêşên malbatê û zêdebûna penaberî û koçberiyê ku bi awayek ser dest bûye sedemên peydabûna pirsgirêka parçebûna malbatê û gotina Nivîskar “Hill” piştrast dibe yê ku digot sedema serekî ji bo vê pirsgirêkê “şer”e.

Civaka Kurdî ji serdemên kevin de di nav şer û pevçûnên welatan de dijî, herwiha siyaseta rêjîmên desthelatdar li ser gelê Kurd bûye eger ku di her malbateke Kurd de endamek jê dûrî maliyên xwe dikeve, millet penaberî welatan dibin, berdana jin û mêr an zêdetir bûye , qutbûna zarokan ji bav yan dayikê , zewaca keçên kêmî 18 saliyê ber bi zêdebûnê diçe, çi li Rojavayê Kurdistanê yan li kampên penaberiyê.

Malbatên Kurd ji dîroka kevin de ta niha bi hevgirtin, yekrêzî û hezkirin tê naskirin, ku serkêşê malbatê tekezî li ser kombûna maliyên xwe dikir û keç herdem bi dayikên xwe re karên malê dikirin, danûstandin jî di navbera wan de peyda dibû.

Rast e, ku hinek asteng û kêmasî di nav malbatina de hebûn

lê bi giştî hevdû girêday maye.

Tevlî ku Şoreşa Sûriyê derfetên avakirina saziyên gel li Rojavayê Kurdistanê vekir, û karên baş li gor gotina xelkên deverê hatin kirin, lê hîn ew sazî nikarîne pirsgirêka parçebûna malbatê kêm bikin yan rolek aktîv hebe bo nehêlana penaberûna malbat û gencan bo welatên cîhanê, yan saziyên li wan welatan yên ku bi karên penaberan radibin nikarin bibin jêderek baş bo wan li dema ku pêwistîya van malbat û gencan pê hebe.

Egerên civakî, aborî, derûnî û pêşkeftina teknolojî wiha kiriye ku êdî hest û têkeliyên yek malbat kêm bibe û gelek keç û xort berev karên xirab herin û serbest jiyana xwe bibin serî bê ku li ber çavê dayik û bavên xwe fêrî karên baş bibin û çanda xwe jibîr dikin, têkiliya xortan bi civakên nû re kûr dibin û gelek ji wan bi çanda dûrî civaka xwe tên girêdan, Wek tê zanîn civaka biyanî ya ku gelek xort û malbat tevlî dibin gelek cudahî bi civaka Kurdî re heye.

Di civakên biyanî de her endamek jiyana xwe ya taybet avakiriye bê ku li endamên malbata xwe yên din vegere, îde serkêşê malbatê bi rola xwe yê rast narabe û danûsitandin pir kêm di nav wan de tê kirin.

zêdebarî pêşkeftinên li cîhanê, herwiha penaberî û dûrbûn ji hev, lê malbatên Kurd hîn girêdanên wan bihêz in, û peywendî di navbera wan de xurt dimînin, wiha diyar dibe ku civaka Kurdî ji civakên din bihêztir e .Jiber ku malbat ber bi parçebûnê ve neçe, çi pêwîst e?

Çareserî jibo pirsgirêkên berdanê hebin, hişiyarbûna jin û mêr an li dema gengeşê ku li dûrî zarokan bê kirin, herwiha têkiliya bav û dê, an bi zarokên xwe re bihêztir bibe, û mifa wergirtin ji tiknolojiyê bê kirin, û diyarkirina başî û xirabiyên wê, dîsan tekez kirin li ser xurtkirina peywendiyên civakî, û giringîdan bi xwendin, zanîn û rewşa derûnî ya zarokan û peydakirina aramiyê jibo wan.

Rast e, dem dema vekirin û pêşkeftinê ye û pêwîst e têkilî di navbera civakan de û mifa ji çandên wan bê kirin û çanda xwe jî ji bo wan welatan bidin naskirin, Lê yekbûna malbatê yek ji stûnên civaka Kurdî ye, û pêwîst e zarokên wê biparêzin jibo paşerojeke geş..

Hêlûna Şaristaniyê



Merwan Berekat

Dema ku herdu memikên wê yên jînmêj bûn lêmiştzê, Cûdiyê pêdar û aştîxwez hemêza xwe ji keştiya baprê Birasoz re kire rawestgeh.

Milek Zagros… yak jî Amanos e. Du memikên jiyanmêj Ferat û Dicle. Bihuşta zemîn.. landika şaristaniyê û telbîsê zîldana hebûna mirovahiyê… KURDONÎS.

Qada xwedêwendên evîn, çeng, siruşt, bahoz û wargeha vejînê KURDIYALî. Di bihuşta pîroz de, gîhane hev nîştecihên erd û ezmên.

Li peravên av û çemên pîroz, di nav zêrîniya zeviyên gênim de û di paşela daristanên ku ji hilma dêrîniyê hatine avdan de, xwedêwendan evsan û destane li ser zimanê dîrokê nîgar kirine.

Xwedêwend bûn? Erê.. û belkî jî, na. Hin bi yeknav û hin jî, bi pirnav bûn. Hin dilsoz bûn û hinan jî, konikê tirsa jiyana duyem di giyanan de dihûnandin. Mirov jî, li ber deriyên perestgehan dibûn qorban.

Bîna xwînê her di pozê ``Adînos`` de bû. Hîn jî, bîn û rengê xwînê ji hin çeman nehatuye şoştin. Lê ``Aşterûtê`` li KARDO tovên evîn, zanîn û aştiyê diçand.

Nêçîrvanê zîrek ``Temoz`` perçak ji xweşikbûna ``Aşterûtê`` bû. Belê, ``Gilgamêş`` dîdevan bû. Xweşikbûn, bedewî û çelengiya XORIYAN baweriya Axnaton jî, serûbin guhartin. Belê, geliyê Qiralan belgenameya wê firkê ye.

Belkî rast be, ku ``Afrodît`` ji kefa deryayê hatibe afrandin. Lê, ew ji fermnadarê êgir, ceng û lêdanê ``Felekan`` revî. Li KURDONÎS tîrkevanê çavên nêçîrvanê jîr û çeleng ``Temoz`` dilê wê revand, û ewan radestî xewna evîndariyeke bê dawî bûn.

Pir caran berazan riya xwe bi vê bihuştê xistin û şopên xwînî li py xwe hîştin. Pir karwanê talanker, pêjnên revok, siha dûmanên ziwa û jînkujer jî, di newqa welatê bawermendên rojê re bê şop derbaz bûn. Lê hinan, rengê tariyê ji gewriya xwe dadirivandin.

Hîn gerdenê çîrokên evîndariya xwedêwendan di stiwê çerx û serdeman de, birîn û şahiyan nîşan dide. Fermandarê şer xwe xiste eyarê berazekî çolane û jiyana ``Temoz`` bere nemiriyê têveda.

``Afrodît`` bi nênûkan memikên xwe qepirandin û li şûna dilopên xwînê kulîk bişkuvîn. Hîn jî, KURDISTANÎ dibêjin ``bûkmezave``.

Pîroz e… KURDISTAN. Li ber kaniya Spî, gelawêj xast û tazî dimeşe û bi şûna rawestandina qeyîqa serwerê heft ferişteyên jînafrandinê lêvên xwe pîroz dike.

Dilovan e…. KURDONÎS.

Di Riya Koçberiye De (4-4)

Çima, û ji bo çi, û li ser çi, û di ber çi de, lê diyar e ku ne dema bersiva van pirsa ye.

Hîna ew bûyer rojane çêdibin û pirsên te bêtir dibin û xwe dihepişênin sebeta serê te û cih li hêvî û geşbîniyê teng dikin.

Wan leşkeran win yeko yeko seh kirin û bi qerebalixa xwe sawa we di hestiyên we de diçikiland, her telefonê destan yên buha û hêja ji we sitandin, erê ew in neviyên Komonistiyê û piştgirê hejar û belengazan, û win avêtin qûna çend turumbêlan û win ber bi riya di navbera Tirkiyê û Bulgaristanê re birin, li wir destên xwe dirêjî we kirin û ta bi wan zarokên biçûk jî ji vê yekê bê par neman, erê bere xwediyên we li ser we bigrîn û bervaniyê di ber we de bikin, win li ser wê riyê danîn û gotin de vegerin cihê ku win jê hatin.

Bi kêf we da ser riya vegerê, baş e ku ev yek bi çend şeqam û pihîn û dijûnan bi dawî bû, gelo heger tiştekî dî bikira kê dikarîbû destên wan bigre.

We da raçengî hev û hêviya derbasbûnê di ber sînga wê şevê de we veşart, lê tirsa ku win berê vê sibehê ji aliyê hêzên Tirk ve werin girtin gavên we tewşomeşo dikirin, û win li ser wê riyê diherikîn tevî ku win nizanin win li kû ne, an jî ev rê diçe ku, lê divabû win riya xwe berdewam bikin ta bibe sibeh û win çareyekê ji xwe re bibînin.

Rêberê we dev ji we berda û hevalên wî bi turumbêlekê hatin û ew revand û win di windabûnê de hiştin.

Ew hevalê ku bi te re dimeşî xwe li kêleka rê dirêj dike, û dibêje ez hew dikarim bimeşim, û ez ê li vir bi tena xwe bimînim ta roj bihile, lê tu gelek lavlavê jê dike û xwe qurbanî wî dike ta ku tu wî qayil bikî da ew jî bi we re bimeşe, birayo ev cihekî bê xwedî ye, û tu dibînî turumbêlek berê vê sibehê li me nasekine, bervajî wilo dema ew nêzîkî me dibin ew agir didine turbêlên xwe û xurtir dikin ji tirsa me, ji wan weye ka em reşkê şevê ne, an em çete ne berê vê sibehê em li nêçîrekê digerin, û tu nizanî çi lawir û dirinde di nav vê daristanê de hene, çênabe tu li vir bimînî ka ez û te em ê hêdî..hêdî bi hev re bimeşin, lê bere hevalên me ji ber çavên me winda nebin, bi van gotin û xwequrbankirinê tu zora hevalê xwe dibî û wî bi xwe re dimeşîne.

Hin ji wan xortan xwe li ser rê dirêj dikin û dibêjin em nema ji wir diçin û çi dibe bere bibe, lê dîsa tu xwe qurbanî wan dikî û ji wan re dibêjî çênabe hûn xwe li ser vê riyê dirêj bikin, heger ajokerekî bê bav hat dikare pê li we bike û here û em nikarin tiştekî bikin, geh bi lavlavan û geh bi şirovekirinê tu hewil didî wan xortan ji wê metirsiyê bidûr bixe, dawî ev yek çû serê piştî ku wan xortan xeber û dijûnin ne Amûdkî belkî huneriya xwe tev de di avakirina dijûnin nû de derxistin…. ne xem e ya giring ew e ku hûn riya vegerê berdewam bikin, lê bêguman çavên tirsê zora xewê û westandinê dibin.

Win nîzîkî leşkergehekê dibin û ji tirsa girtinê win qûneqûna dibin, lê dengê wî pasvanî yê ku li ber dergehê wê bû hinekî we aram dike.

Bi kurdî bang li we kir, werin Kurdo…Kurmanco..werin…netirsin werin.

Xuya ye ku ew jî kurd e, lê tevî vê yekê jî hîna win bi saw in ku xwe bispêrin destê wî, ji ber wilo win yekî bi temen mezin rê dikin cem wî pasvanî, piştî ku hûn lê ewle bûn hûn tev de diçin.

Wî dikarîbû Basekê ji we re kirê bike da we vegerîne Istenbolê.

Çend Xal û Mînak

Ciwanê Ebdal

Weke nêrîn-bazekî. û bi zimanê Kurd mijûl e. em dibînin ku çawa ev ziman di aloziyan de derbas dibe. çi di zimanê peyv û gotinê rojane de. di civakê de. an çi di mînaka tore û wêjeyê de..

Weke Bangek giring. di vê qonaxê de. divê nivîskar bi tevaya çuyerên xwe. her yek ji wan xebata ziman bike. xebata sereke di jiyana wêje û toreya xwe de. bi beşê ew pê mijûl e. çi di helbest. çîrok. û gotarê de be. çi di peyv û gotinê de be. an divê parastin û pêşde-birina zimanê Kurdî bikin. berî beşên din ji rewşa wêjeyê de.

Jiber zimanê me hebûna me ye. nasnama me ye. divê em wê bi çakî bikar bînin. pê bipeyivin. şirove bikin. xweş reseniya wê saz bikin.

Belê. ne dozli nivîskar û rewşenbîra tenê ye. divê sazî û rêxistinê Kurda jî li ber vê aloziyê kar û xebata xwe bikin.

Ango reseniya xwe bigrin ji şopemayina Kurdî ya kevnar. jiber ew bi xwe resen û bingehîna zimane parastiye. û ew hiştiye bê zexelî be.

Zimanê me li devê me şêrîn e. nayê parastin heger em wî û pendê wî şirove nekin. rêzimanî bo wî çênekin. weke Mîr Celadat ku destpê kiribû. û bi alîkariya hinkî din yên dilêşiya vî zimanî hiltanîn.

Bi rastî. divê vejîna ziman bibe ji gelê Kurdan re man yan nemana wan. jiber ew bi xwe ji giringtirîn bingeha sitûna milleta ye. nasnama netewa pê bi cih dibe. jiber ziman tenê nasnamê dide gelan. lê pirsa mezin ew e ku çawa em ê vî zimanî biparêzin an çawa bi pêş de bibin? jiber ew bi xwe tenê dikare hêvî û êşa Kurda hilîne. reng û şêwa wan bi cih bîne. di şaristana cîhanê de. çimkî wêje û tore neynika gel e. li ber rûkê dunyayê.

Weke kesekî mijûl e bi şêwên tore û wêjeyê. pir rexn hene di divê me. Ku hin kes bi çend helbest û kurteçîrokên xwe. yê her carê bi hev re wan berhema bi xwe dişîne deh kovaran. û dibêje ez jî rewşenbîr im. û tu kesek diafirandina helbest û çîrokan de. û di wêje û toreyê de nigê xwe li nigê min naxîne an. û berhemên kesên din tev badîhewhane..

Belê.. ev yeka ji mafê her kesî ye. ku her yek pesnê xwe bide. û bêje: Ez û bes. ango kes nabêje: (mastê min tirş e.(

Û bi rastî ev rewşenbîrê me. tu mastî ne dikire û ne tam dike. jiber tam li dev tune ye. û her zimanê wî di devê wî de li derve ye. dev davêje xwe û dibêje. an xwendin li cem tuneye :

Çima xwendin û sergêjkirin. ez tev de me?».Û serê xwe dixe bin çenkên xwe. bihna xwe tenê dike.

Tevî ku em dizanin. xwendina berheman pir sudê dide. jiber ezmûneke jiyanî dide.

Belê. Ne ev tenê jî. xwezî bi vê tenê ba. lê ya mezintir ewe ku dibêje:

Tiştê ez dikim. partiyê me bi qasî min nake. ma kî weke min heye.. Ez qurbana xwe bim.. tenê».

Tenê li ezeziya xwe digere. ne ku rahiştiya nama gel û mirovatiyê.. bo jiyana xweştirîna têgihiştinê.

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545
bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Melle Nayifê Hiso "Seydayê Tîrêj"

Melle Nayifê Hiso ye, di sala 1923an de li gundê Nicmok yê bi bajarê Qamişlo ve girêdayî ye jidayik bûye. Di şeş saliya xwe de bar kir gundê Tûkê, dûv re çû gundê Sê Mitkê Newaf, û li wir li ser destê Melle Ibrahîmê Quran xwendiye.

BAQÊ KEZÎ

Kurdo rabe ser hilde ji xew
Şev çû îdî berbange ye

Rojê ji reş va hilveda
Pir gulşen ûpir şûle ye

Rewşen dikî çol û beyar
Gulşen dikî koh û zinar
Dijmin li dor te çarkenar

Girtin kemîn û helqe ye

Bê deşt û zozan û xelat
Çwa dikî îro tebat

Carek binêre tu l'welat
Yekser dijî pêgane ye

Bes ke xewê ey bê mecal
Rabe bi yekîtî û heval

Azad kevê qada delal
Ew mesken û warê te ye

Bizan bi sed ax û xwezî
Dest naçe ser baqê kezî
Dijmin şivan e tu pezî
Sed gur binêr li dora te ye
Dengê me çû çerxa felek
Hîşyar kirin îns û melek
Rabe ji xew vêga demek
Tîrêj dem û dewra te ye

BILBILÊ DILŞADÎ

Ey bilbilê dilşadî hela , wer bike fîxan
Derdê me girane ey bira , birîna me kûr e

Gorî te bitin cerg û dil û mêlak ê hem can
Dengê te ye xweştir , ji ney û nay û bilûrê
Sê hawe te deng , yek ji sira bayê siba ye
Hawayê dî ji dengê xuşîna dehl û reza ye

Hawê sisîya ji bihna şemamok û gula ye
Lewra ku li dinyê tu bi nav û tu meşûr e

Karwanê me va bi rê ketî , lê şevreş û tarî
Serma ye terez kulyên di berfê her dibarî

Bahoz e çelapek têne me , ji her çar kenarî
Warê me welat e ey heval , rêça me dûr e
Çar hawîr me diz û keleş in , têk dane dijmin
Me ji hev radiqetînin bir bi bir , heyf û mixa bin

Qet çarew umîda me nema ye bilbilê min
Meydan e ji bo hirç û çeqel , gur zûre zûr e
Meydane ji bo hirç û çeqel , rovî û keftar
Gorî te bim bilbil , ji serê darê tu wer xwar
Da pêk ve mijûl bim , bi xwe çend rojên di dijwar
Îro li me ferman e , li ser gerdenê şûr e
Destê tewqyê îro ku em herdu bidin hev
Çend sal û zemanên di xerab jîn em di gel hev
Dinya bi xwe dewran e , bizan geh roj e , geh şev
Geh tarî û dûman e û geh rewşen û nûr e
Dîna xwe bide nik bayê barîn ey birader
Sitêra sibê îro ji şerqê li me da der
Rewşen kirî Kurdistan ,bi carek wê seraser
Nîşana sibê ye , fereca xêrê ne dûr e
Piştê wê sitêrê bi xwe berbanga sibê ye
Wê roj hilê rohnî têkeve şûna şevê ye
Karwanê me wê bighêje war û meqsedê ye
Çerxa felekê herdem bi fetl û ger û dewr e
Çexa felekê herdem bi fetl û ger û dewran
Hêvî û hawara me di Yezdanê dilovan
Umîd me herdem bi xwe serdarê li Berzan
Wek Tîrêj dibêje:jîn divê kotek û zor e.

TAVA XIZÊMÊ

çawa ezê te'j bîr bikim
ey çîçeka ber vî dilî
eşqa te har û dîn kirim
derdên te dan ser vî kulî
bi soz û bawerya berê
terka te nakim koçerê
b'cerda giran û leşkerê
Zor Temir başayê Milî
nakim jibîr sebra dila
çavên direş kanya kila
sîng meshefa şêx û mela
ezber dikim vî rûpelî
pozê çilagî mermere
tava xizêmê da sere
mîna dilopek `enbere
xala li dêmê sorgulî
dêm k'ebeye xal ew bere
dêm tore lê xal agire
xal pût û latê Azere
xal Laleşê nîva gelî
ey olperestê dîl û jar
xizmet nekî bi kar û bar
naghêje armancê tu car
sofî bi dev nabî welî
xizmet nekî tu'b roj û şev
bawer nekî bi dil û dev
fermo ji meydanê birev
bê gazin û lewm û gilî
yê ku nebî yarek bedew çi
fêm dikî j'dinya xwe ew
hovê çiyaye bê derew
lê be hezar ax û xwelî
rûniştinek nêv dîlbera
camek ji destê esmera
nadim bi melyonê pera
nadim bi zêrê surmelî
nadim bi Bexda û Ferat
nadim bi milkê Rojhilat
nadim bi zozan û xelat
çimek ji neynûka tilî
ey xanima birc û seran
ser deftera dêm gewheran
vê emr û fermana giran
êdî ji ser Tîrêj hilî.

Buhar

Buhar dem û dewra minê
Serpişk û hem para minê
Bax û gulîzara minê
Mêrg û gulîstana minê
Rewşa dinê kêfa dila
Cê 'ndelîb û bilbila
Derman dikî derd û kula
Xweş geşt û seyrana minê
Dem tu tê şa'ir li ser
Mizgîn didî can û ceger
Şi'r û xezel vedbin li der
Helbest û dîwana minê
Xemla te nîşana zemîn
Kulîlk bi sed reng û bi bîn

Di sala 1938an de tev li dibistanên hikûmî li Amûdê bûye, û pênc salan tê de xwendiye, û di wê demê û li gor dax-waza hevalên xwe di komeleya "Xuybûn" de navê xwe kiriye Tîrêj.

Şa'ir li ser te har û dîn
Adar û nîsana minê
Adar û nîsan û gulan
Xemla te heft rengê gulan
Mirxo bi kewt û xulxulan
Newroz û sersala minê
Şa'ir bi te serxweş dibî
Sukran û mest bê hiş dibî
Xemkêş bi te dilgeş dibî
Bade û meyxana minê
Kulîlkêd kesk û sor û zer
Şebnem di nêv xunce li ser
Bêhn û bexê davêjne ser
Xweş misk û rîhana minê
Xweş misk û rîhan û gulav
Şev pêde her lê tê xunav
Bayê siba der tê ji nav
Xweş çax û dewrana minê
Kulîlk û rîhan û giya
Gulşen dikin çol û çiya
Lûsê xezal û koviya
Rewşa kurdistana minê
Xweş çaxe xweş dewran û dem
Fikr û xeyala min li cem



Gora seydayê tîrêj

Stranên Seydayê Tîrêj ji hêla pirên dengbêj û hunermedên kurdan hatine goti n mîna Seîd Gabarî, şivan Perwer, Mihemed şêxo, Beha şêxo, û Remedan Necim Omerî. Herweha gelek komên Filiklorî jî wek koma Orkêş û Xelat.

Dunya mi dî keys û fesal
Soz nîne ramana minê
Dunya li tîrêj bû xelek
Zor û setem dîtî gelek
Gog bû li ber kaşwê felek
Sergol û meydana minê.

LEBTA DIL

Jana evînê wa ji dil avête nav penc û reha
îro di wa kuncên di reş bûm xesteyê sal û meha
textor li ser min pir civîn derman mixabin lê nehat
sed derzî û toz û hebik ji toxmê erzan û beha
şaş mane ew textor hemî tev keten tatûla giran
pêkve hemî çûn dil bi kul poşman û tev gerden zuha
hemyan ji ser min dane rê bê hêvî û çar û ûmîd
çare di vê êşê nedîn beyhûde wan yek ji deha
textorekî zana û jîr ew Pesnê te têr nadî qelem
Tu sebr û samana minê
Wextê mi çû bûm pîr û kal
Emrê bû heftê û di sal hate ser min bê guman
ez wergerandim rast û çeb lepta dilêm da ber guha
nêrî li min û ser hejand go kawiko derman eve
sêvên xelat û mişmişên bajarê Çermûk û Ruha

Mewlûda pêxember

Bi navê xudanê cîhan û felek
Xudanê hemî ins û cin û melek
Xudanê hemî murx û hov û teba
Xudanê meh û sal û roj û şeba
Yeke tim heye dê hebit her Xuda
Ne hinkûf û ne hember ne bav û ne da
Ne laş û ne ten, hem ne pê û ne çeng
Ne nîşan û ne çehr û kilîş û ne reng
Ne xwîn û ne agir ne ax û ne av
Ne roj û ne heyve, ne sî û ne tav
Ne sor û ne gewre ne kesk û ne şîn
Ne 'ewr û ne ba ye, ne misk û ne bîn
Li her cî dijî wî ne razan û xew
Ko herdem şiyar e, bi roj û bi şew
Çi pesnî bidim em ji wî re xelet
Çi rengî bidin wî ne ew reng e qet
Ji bo ademîzad weha mijde da
Bi zarê xwe î xweş we gotî: Xuda
Ne pêjin di rengê mi de merî
Binêre li tiştê ko min çêkirî
Xuda çêkirî asîmanê bilind
Sitêr kirne jê re wekî mûm û find
Hinek nalivin hin bi dewran û ger
Belavin ji hev hin li bin hin li ser
Ko ev heyv û roj tim ji

Di roja şemiyê de 23/3/2002an de li bajarê Hesekê çû ber dilovaniya xwedê, û pişt re bi du rojan li gundê Gir Keftar hate veşartin.

rengê kelek
Li pê hev rewan in, di çerxa felek

Çi dûr û cidane gelek ew ji hev
Ji rojê re ro lê ji heyvê re şev

Ko her yek di şopa xwe de tê û diçî
Bi emrê Xuda tim diyek rê û cî

www.buyerperss.com
buyerperss buyerperss
buyerpersss@gmail.com
Whats App 00905368908545

bûyer PRESS
Nûçe... Bi Zelalî

Mamik

Wek şivanê berxika
Dinêre li zaroka
Fêr dike hêdîka
Zanîn û tiştika!
****
Awayê max û holê
Zaran re wek malê
Kursî û mase li balê
Cîhê fêrbûna salê!
****
Li maxa bi dîwarî
Çar çivê bi kêrî
Wekî derî
Roj jê dibarî
Têkdiçe tarî!

Bersiva Mamikên Hejmara 40î
Pirtûk – Jêbir - Rastkêş

Xaçerêz

	1	2	3	4	5	6	7	8
1								
2							■	
3				■				
4						■		
5			■					
6	■	■			■			
7			■					
8				■			■	

Asoyî:

1- Stranbêjî.
2- Bi dizî dibe (vajî).
3- Ciyekî daran e, tiştek lê tine ye.
4- Bajarekî li Tirkiyê, kul.
5- Jibo pirsa kesekî, berhema dereng.
6- Wekhev, jibo avê tê kolan.
7- Cih (vajî), xezne (belawela).
8- Deryayek e, kûçik (vajî).

Sitûnî:

1- Bajarekî Rojava, wekhev.
2- Ezîtî, wekhev.
3- Tersî bilind.
4- Gid (bê dengdêr), erda çandiniyê (vajî).
5- Bivir (belawela), tîpek e.
6- Paşnavê şehîdê Newrozê (vajî), saman (vajî).
7- Ramyarekî komonîst.
8- Xizanî û azarkêşî (vajî).

Bersiva peyîva windayî hejmara40î: Avdar

Peyva wendayî

Barê zana li pişta nezana. Birçî ye weke gurê har, tazî ye weke mar.Jin jiyan e.

Peyva wendayî: Ji 4 tîpan: Paşnavê nivîskarê Memûzînê ye.

	1	2	3	4	5	6	7	8
1	N	X	A	A	T	Ş	I	P
2	E	B	A	R	Ê	J	I	N
3	Z	Z	A	N	T	A	Z	Î
4	A	M	A	R	W	E	K	E
5	N	L	I	N	W	E	K	E
6	A	H	A	R	W	E	K	E
7	Y	E	Î	Î	Ç	R	I	B
8	J	I	Y	A	N	E	Y	E

Bersiv Xacerez 40

	1	2	3	4	5	6	7	8
	E	Ş	R	E	F	I	Y	Ê
	R	I	Z	G	A	R	Î	■
	E	V	■	Î	Ş	E	V	■
	B	■	Î	D	Î	M	■	Û
	Ş	O	R	■	S	■	Û	D
	E	N	A	L	T	E	B	■
	M	Î	N	A	■	V	E	D
	O	D	■	K	Ş	Î	N	E

Camiya Mezin Li Amûdê.. Avakirin.



Mizgefta mezin li Amûdê. yan camiya mezin weke ku xelkê Amûdê wê bi nav dikin.. berî bêtir ji 125saln hatiye avakirin. di pêşî de mîna odeyekji heriyê bû. jib o nimêjê hatibû avakirin. Di salên dagîrkirina Firensa ji Sûriyê re Birahîm Axa mizgeft ji nû ve ava kir û kevirên wê ji devera Darê li Bakurê Kurdistanê anî. ew jî bi pereyên xelkê Amûdê ku jib o vê yekê dabûn hev.

Dibistanek oldarî. di rojên berê de. li rex mizgeftê hebû. zarokên Amûdê tê de bi zimanî Kurdî fêrî Qurana pîroz û hedîsa pêximber dibûn. û bi dehan ji xelkê Amûdê bawername jê wergirtin.

Ji ber camî teng bû û têra nimêjkeran nedikr. di sala 1937an de Ebdiletîfê Seyda ku di wê demê de îmamê camiyê bû ew fireh kir. û firehbûna bû 27X27an de. û wisa bû ji mezintirîn mizgeftên deverê.

Wêneyê camiyê ji rûpela birêz "Ebdilhemid Hesen" e.